

K.T.

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

**LATÎNÎZEKIRINA “KİTABÛ NEZHETU’N-
NUFÛS” A MELE MIHEMED NURÎ**

(BEŞ II.)

Behçet TOPRAK

15721107

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2017

K.T.

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

**LATÎNÎZEKIRINA “KİTABÛ NEZHETU’N-
NUFÛS” A MELE MIHEMED NURÎ**

(BEŞ II.)

Behçet TOPRAK

15721107

Şewirmend

Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2017

KURTE

Wekî ku di hemû nesîhetnameyan de armanc û nîyet şîretdayîn e. Her wiha, di berhema me ya bi navê *Kîtabû Nezhetu'n-Nufûs* a Mele Mihemed Nûrî de jî armanc û nîyet şîretdayîn e. Nivîskar bi awayekî hosteyî û bi zimanekî rojane û edebî dixwaze mijara xwe bi xwendevanan bide fêhmkirin.

Nivîskarê berhemê ewladê Resûl Seyyîd Mele Mihemed Nûrî jî gundê Mîrzebegan e. Navê bavê wî Mele Evdila ye. Di sala 1894'an de li gundê Sînanê ku li rojavayê Êlihê dikeve jî dayik bûye. Li medreseyan wek Sînanê, Dîyarbekirê, Gozleşêxê, Cîrzê û Dêrika Çîyayê Mazî xwendiyê. Seyda 'umrê xwe di medreseyan de bi perwerdeya feqîyan û mutala'a kitêbên 'ilmî de derbas kiriye. Li gelek cîyan meletî kiriye. Yek ji van cîyan jî Hecî 'Îsê ku girêdayî Dîyarbekirê ye. Seyda li vir 50 sal meletî kirîye. Di sala 1977'an de li vî gundî wefat kiriye û li goristana Seyfulmulûk hatiye definkirin.

Gelek berhemên menzûm nivîsiye. Navên berhemên wî ev in: *Kîtabul 'Îsra-î Wel Mî'rac*, mî'racîye ye, 138 rûpel e. *Durrul Yetîm*, ev berhem wînda ye, lê, perçekî ji benda çardehem li ber dest e. Berhem dî der heqê mersîya Hazretî Huseyn da ye. Her wiha ev perçe jî ji aliyê mele Zeynelabîdîn ve hatîye çapkirin. *Dîwana* Seyda jî berhemek din e. Ev berhem sed û bîst rûpel e. Bî veznek selis û fesîh hatîye nezîmkirin. A çaremîn *Kitêba Fiqhê* ye. Ew jî li ser mezhebê Îmamê Şafî'î ye. Berhema Seyda ya dawîn ku me li ser xebat kiriye jî *Nezhetu'n-Nufûs* e. Ev berhem nesîhet û şîretî ye. Seyda di 1960'î de ev berhema menzûm qedandiyê. Berhem di sala 2004'an de ji hêla Zeynelabîdîn Amidî ve li Çapxaneyê Diyarbakîr Sözü'ê hatiye çapkirin.

Bi kurtî mijara berhemê ev e: Lehengê sereke yê berhemê Tacir 'Elîyê Hesên, guh li wesiyeta bavê xwe nake û bi mirovên nebaş re hevaltîyê dike û dikeve nav têkilîyên bêkêr. Lê wekî her tim dawîya van hevaltî û têkilîyên bi mirovên nebaş û bêkêr re poşmanî ye, aqûbeta 'Elî jî tije poşmanî û perîşanî ye. Ne tenê 'Elî, malbata wî jî ji vî perîşanîyê têra xwe par digire. Piştî perîşanî û poşmanîyan, bi emrê Xwedayê Te'ala, bi alîkarîya dostê bavê xwe û bi navbeynkarîya cin û perîyan dawî li perîşanîya 'Elî û malbata wî tê.

Bêjeyên Sereke: Edebiyata kurdî ya klasîk, Mele Mihemed Nûrî, Nuzhet'n-Nufûs, nesîhetnameyên manzum

ÖZET

Nasihatname türü eserlerin genel amacı ve niyeti öğüt vermektir. Keza, Mele Mihemed Nuri'nin Kîtabû Nuzhetu'n-Nufûs adlı eserinde de amacı öğüt vermektir. Yazar büyük bir ustalık ve gündelik bir dille ancak edebi şekilde bu konuyu okuyucularına anlatmak istemiştir.

Kitabın yazarı Evlad-ı Resul Seyyid Mele Mihemed Nuri, Mirzebagan köyündendir. Babasının adı Mele Evdıla'dır. 1894 yılında Batman ilinin batısında yer alan Sinan köyünde doğmuştur. Sinan, Diyarbakır, Güzelşeyh, Cırze ve Derik medreselerinde eğitim görmüştür. Seyda hayatını medreselerde talebe yetiştirmekle ve ilmi kitapların mütalaasıyla geçirmiştir. Birçok yerde imamlık yapmıştır. Bu yerlerden biri de Diyarbakır'a bağlı Hecî 'Îsê köyüdür. Seyda burada 50 yıl imamlık yapmıştır. 1977'de burada vefat etmiş ve Seyfulmulük kabristanına defnedilmiştir.

Birçok manzum eser yazmıştır. Eserlerinin isimleri şunlardır: *Kîtabul Îsra-i Wel Mi'rac*, konusu Mi'ractır. 138 sayfadır. *Durril Yetim* ise kayıptır. Ancak esertin 14. Bendi mevcuttur. Bu eser Hazreti Hüseyinin hakkında bir mersiye'dir. Keza bu eser de Mele Zeynelabidin tarafından basılmıştır. *Dîwan* ise Seydanın diğer bir eseridir. Bu eser de 120 sayfadır. Akıcı ve fasih manzumdur. Dördüncüsü de *Kitêba Fiqhê* adlı eserdir. Bu eserde İmam-i Şafii fikhî üzerinedir. Bizim de üzerinde çalıştığımız, Seydanın son eseri olan *Nezhetun-Nüfûs*'ün konusu ise nasihat'tır.

Seyda bu manzum eserini 1960 yılında tamamlamıştır. Eser 2004 yılında Zeynelabidin Amidi tarafından Diyarbakır Söz Yayınevi'ne bastırılmıştır.

Kısaca eserin konusu şudur: kitabın başkahramanı tüccar Hasan Oğlu Ali, babasının vasiyetini dinlemeyerek kötü insanlarla arkadaşlık yapar ve faydasız ilişkilere girer. Her zaman olduğu gibi bu faydasız, kötü arkadaşlık ve ilişkilerin sonu pişmanlıktır. Ali'nin de akibeti pişmanlık ve perişanlıktır. Yalnızca Ali değil, ailesi de bu perişanlık ve pişmanlıktan nasibini almıştır. Bu perişanlık ve pişmanlıkların sonunda Allah'ın emri, babasının dostlarının yardımları ve cin ve perilerin aracılığıyla bu perişanlıkları son buluyor.

NAVEROK

KURTE	III
ÖZET	IV
NAVEROK	V
PÊŞGOTIN	VI

DESTPÊK

Pendname, nesîhetname di edebiyata klasik de.....	1
Beşa Yekem	3
A. Jiyan û Berhemên Mele Mihemed Nûrî	3
B. Ji aliyê ruxsarî û naverokê ve Nezhettu'n Nufûs.....	3
Beşa Duyem	5
2. TRANSKİRÎBSIYONA BERHEMÊ.....	5
ENCAM.....	55
ÇAVKANÎ	56
PÊVEK	57

PÊŞGOTIN

Me wek xwendevanê lîsansa bilind a bêtez ji bo projeya lîsansa bilind xwest ku mijarek edebîyata klasîk hilbijêrin û bi şêwirmendê me mamoste Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR re şêwirîn. Bi pêşniyara Mamostê me mijara latînzekirinê ji bo xwe wek proje hilgirt. Lê dema me dest bi xebatê kir me dît ku bi rastî jî piştî avabûna Komara Tirkîyê û pê re girtina medreseyan, berhemên bi tîpên Erebi hatine nivîsîn di nava dîrokê de veşartî mane û negihîştine roja me. Ango bi vî awayî têkilîya gelê vê demê ji paşerojê hatiye qutkirin. Hemû nirxên edebî û pê re jî yê civakî di nav rûpelên pirtûkên bi tîpê Erebi hatine nivîsîn de winda bûne û vê yekê jî pêwîstîyeke girîng û bi rûmet derxistîye pêşîya me, da ku em bi vê xebatê bibin pirek di navbera pêşeroj û paşerojê de.

Me di vê xebatê de hewl da ku, kêmasîya di vî warî de li gorî xwe hinekî ji holê rakin.

Çarçoveya xebata me ev e: Di Despêkê de me wek berhemek edebî nesîhetname û mînakên edebî nirxand. Di Beşa Yekemîn de me ji aliyê ruxsarî û naverokê ve berhem nirxand. Di Beşa Duyemîn de me berhem latînze kir. Di Encamê de me şîreta nivîskar ku dixwaze bide xwendevanan nirxand. Di Çavkanîyê de çavkanîyên ku me jê sûd wergirt nivîsand. Di Pêvekê de me metnê berhemê yê orjînal bi xebatê ve kir.

Di amadekirina vê xebatê de ji kesên ku keda wan hene, di serî de ji Mamoste Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR re sipas dikim. Wî şêwirmendiya min kir û alîkarî da min. Her weha ji şîrîkê min ê projeyê (Beş II.) Mamoste Saadettin BATUR re jî sipas dikim.

Behçet TOPRAK

Mêrdîn 2017

DESTPÊK

Pendame, nesîhetname di edebiyata klasik de

Pendname perwerdekirina ferd û civakê, di dewletê de bi armanca temînkirina hizûr û pergalê bi gelemperî navê berhemên tên nivîsînê ne.

Ji bo civakek hestiyar ku ji kesên durist û biexlaq pêk tê bînin holê berhemên ku di cureya şîretdayînê de ne di her çandê de tên dîtin. Bi gelemperî dînen semawî û felsefenasên exlaqê di vê mijarê de rêgezên derxistine holê ji nivîsîna berhemên ji vê cureyê re zemîn amade kiriye. Di vê mijarê de di kevneşopiya ereb û Îranê de jî tê zanîn ku gelek berhem hatine nivîsîn ku nivîsîna pirtûkên nesîhetê di tirkên de rastî piştî serdema misilmanbûna wan tê. Bandora sereke ya berpêbûna helbestvan û muellifan a vê mijarê ayet û hedîsên balkişandina ser dîne îslamê wek dîne nesîhetê ye.

Pendname (nesîhetname) bi gelemperî berhemên exlaqî-dîdaktîk in. Civakên îslamê ji exlaqê teorîk zêdetir girîngî dane sepandina exlaqî, qedexe û emrê dîn. Çavdêriya nivîskaran bixwe, di van berhemên de xebatên zanistî û danhevên çandî cih girtine. Dema ku şîret tên kirin ji ayet, hedîs, gotinên pêşiyar û wecîzeyan sûd tê wergirtin. Herwiha bi vegotina çîrokên muhtelif ji wan ders derxistin tê şîretkirin.

Pendnameyên zêdetir di serdema rûxandina civakê de hatine nivîsîn. Dema qadên nîşanên xerabûnê xuya dikin, cih didin nesîhetên pêşniyarê çareserî yê. Di prosesa dîrokî de bi guherîna feraset û şertan naveroka pendnameyan de jî cudahî tê dîtin.

Her wiha, pirtûkên ku mijara wan rasterast ne pend be û navê pendnameyê hilnegire jî dibê ku çîrok şîreta li mirovan bikin, di nav beş û vegotinên wan de şîret hebin. Wek Mesnewiya Mewlana, Gulîstan û Bostana Sadiyê Şîrazî gelek berhemên ji bo mirovan bi şîretan perwerde bikin dikarin bînin jimartin.

Pendname, zêdetir bi wesfê pirtûka âdâb-1 muâşeret tên tertîpkirin.

Di civakên rojhilat de, bi zimanê pehlewî cureyêke fablan a bi navê Pançatantra tê zanîn ku piştî berhem ji aliyê Îbnu'l-Mukaffa ve bi navê *Kelîle û Dimne* bi zimanê

erebî hate wergerandin mînakên vê cureyê bi lezgînî zêde bûne. *Et-Tâc fî Exlaqî'l-Mulûk* a nîspetî Câhîz tê kirin ji vana mînakeke girîng e. *Kutadgu Bilîg* a Yûsif Has Hacîb, *Siyasetnameya Nîzamulmulk* ji vê cureya pendnameyê re mînakên herî kâmil tê hesabandin. Di gel vana hêja ye ku mîrov behsa *Rîsaletu 'n-Nushîyye* ya Yunus Emre û *Pendame* ya Îbrahîm Gulşenî jî bike. Mînaka herî navdar a erdnîgariya çanda îslamê, *Pendnameya* nîspetî Ferîduddîn Attâr e. Lê, xuya ye ku di vî warî de bilî van berheman jî gelek berhem hene.

Li gorî lêkolînên me yên tahdîtkirî, di edebîyata kurdî ya klasîk de mînakên nesîhetname hema hema tune ne. Tenê em li berhema bi navê *Nasihathnameya Mela Muhemmedê Şoşikî* ku ji alî Halime Yıldız ku li gor pirtûkê ji zimanê Osmanî hatiye wergerandin rast hatin. Lê li gor texmîna me ji ber ku ev nivîskar kurd e îhtîmalek mezin wê berhema orjînal a destxet jî bi kurdî be.

Ev berhem ji bawerîya Xwedayê Te'ala dest pê dike û li ser şeş bingehên bawerîyê disekine. Her wiha dîne îslamê û 5 mercên îslamê jî bi heman rêbazê pêşkêşî xwendevanan dike. Aramî, şikir, teqwa û ji gunehên mezin wek qetl û zinê jî mijarên berhemê yên bingehîn in. Bi giştî mirov dinêre ku, ji ber ola îslamê olek şîretî e, di civaka musulman de berhemên wek şîretname, wekî me li jor jî destnîşankir, zehf in.

Beşa Yekem

A. Jiyan û berhemên mele Mihemed Nûrî

Nivîskarê berhemê ewladê Resûl seyyîd mele Mihemed Nûrî ji gundê Mîrzebegan e. Navê bavê wî mele Evdila ye. Di sala 1894'an de li gundê Sînanê ku li rojavayê Êlihê dikeve ji dayik bûye. Li medreseyan wek Sînanê, Dîyarbekirê, Gozelşêxê, Cirzê û Dêrika Çîyayê Mazî xwendiyê. Seyda 'umrê xwe di medreseyan de bi perwerdeya feqîyan û mutala'a kitêbên 'ilmî de derbas kiriye. Li gelek cîyan meletî kiriye. Yek ji van cîyan jî Hecî 'Îsê ku girêdayî Dîyarbekirê ye. Seyda li vir 50 sal meletî kirîye. Di sala 1977'an de li vî gundî wefat kiriye û li goristana Seyfulmulûk hatiye defînkirin.

Gelek berhemên menzûm nivîsîye. Navên çend berhemên wî ev in: Kîtabul 'Îsra-î Wel Mî'rac, Nuzhetu'n-Nufûs, Durrul Yetîm, Dîwan û kitêba fiqhî ya li ser mezhebê Îmamê Şafi'î. Berhema Nezhê't-Nufûs ku me li ser xebat kiriye kitêbek nesîhet û şîretê ye. Seyda di 1960'î de ev berhema menzûm qedandiyê. Berhem di sala 2004'an de ji alî Zeynelabidîn Amidî ve li çapxaneyê Diyarbakır Sözü'ê hatiye çapkirin.

B. Nirxandina berhemê ji aliyê ruxsarî û naverokê ve

Berhem bi zimanê kurdî û bi tîpên 'erebî ye. Bi kêşa 'erûzê, bi behra muteqarîb û qalîba nesalîm hatiye nivîsandin.

Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl

+ - - / + - - / + - - / + -

Ji beytan/malîkan pêk tê. Her beytek/malîkek di xwe de 2 rêzîkan dihewîne. Rêzîkên berhemê ji 11 kêteyan pêk tên. Her beyt/malîk jî ji 22 kêteyan pêk tê.

Her wiha di hemû rêzîkên beytan/malîkan de hevdengîyek herî kême ji du dengên pêk tê heye. Ji van taybetîyan ku mirov ji serê berhemê heta dawîya berhemê dibîne jî tê fêhm kirin ku nivîskar çiqas hoste û hakimê ziman e.

Nivîskar ji bo mebesta xwe bîne cih, pir caran bi awayekî edebî naverok serkeftî neqîşandîye.

Ji ber ku nivîskar ‘alimekî medresê û seyda ye, termînolojîya îslamî jî di hemû berhemê de bikar anîye. Naveroka berhemê ji erebî gelekî bandor girtîye. Ango gelek peyvên ‘erebî tê de hene. Ji ber ku li medreseyan zimanê perwerdeyê ‘erebî û kurdî ye vê yekê jî bandorek eşkere li ser nivîskar kiriye.

Beşa duyem

Transkrîbekirina berhemê

340. Bira ew senedkî bidin te tamam
Çu da'wa li ser te tune ta qiyam
341. Nîhayet ewî hâkim û şahideyn
Miheyya kirî wî wekî ferdû 'eyn
342. Sened kû nivîsan kilît dane dest
Mirin wî demê wî tucarî dixwest
343. Dema wî duxûl kir bi qesra mexûf
Wekî mujdeyek bêt ji besra û kûf
344. Tucar jê re şandî firaş û bîsat
Li ser hev didanê hemî qat bi qat
345. Heman dî 'Elî birekî pir bi hewl
Di hewşê muheyya bi zincîr û dewl
346. Ewî dewle berda binê bîrê pak
Deranî hinek av li ser rûyê xak
347. Ku destmêjê girtî limêj kir dewam
Heta rû di mexrîb veşarî tamam
348. 'Ebîda gelek et'îmê faxire
Digel ku zû îbrîq û hem saîre

349. Dianîn ji bo wî heta bû dereng
Dixwarî ji wan et'îmê rengereng
350. Dilê wî digo jê re rabe fulan
Xwe bigihîne salona jorî heman
351. Ku belkî rehet bî li wê der gelek
Xwuda xaliqê ins û cinn û melek
352. Metirse ecel her yek e bê gûman
Mebêje ev e meskenê îns û can
353. Nihayet ewî ev firoş û bîsat
Birin taqeya jor hemî qat bi qat
354. Li ser wan dirêj bû bi 'îz û kemal
Dixwendî kelamê şehê layezal
355. Ji hindav de dî şexsekî gazî kir
Kî go ya 'Elîyê Hesen emrê kir
356. Birêjim li ser te gelek sîm û zêr
Digel durr û gewher bi mîslî meter
357. 'Elî da cewabê di wext û zeman
Li kêder birêjî limin gewheran
358. Bi derhal rijandî li ser wî guher
Heta bû tijî odeya zî huner

359. Ji sîm û ji zêr û ji yaqût û mas
Rijandî li ser wî heta bû xelas
360. Li dû wî rica kir ricayek ‘elen
Mi aza bike ya ‘Elîyyê Hesên
361. Ku da ez xelas bim ji vê mîhnetê
Tu derxe ji qelb û dilê hesretê
362. Mi hêvî heye ey ‘Elîyyê delal
Mi aza bikî da biçim pêşî mal
363. Çukû xizmeta min heta vir qeda
Eva çendî sale dikir min eda
364. Mi derxe ji vê mîhnetê el eman
Ricayê dikim ez ji te her zeman
365. ‘Elî da cewabê ji bo maridî
Were tu bibêje çawa bûm xwudî
366. Hetanî nuha min nema milk û mal
Gelo xewn e bêje we ya ev xeyal
367. Cewab da ne xewn û xiyal e bizan
Evî xizne ya ha qedîmê zeman
368. Li ser te resid bû bizane ji min
Çi nî’met ku da te Xwudayê mezin

369. Berê te kesê kû dixûl bû li vir
Hema me ‘ecel kir ewî qetlê kir
370. Çikû me ji wî ra digo ya ‘Elî
Bidin te gelek zêr û zîv û hulî
371. Dema wî bihîstî kelimê di me
Hema ew ditirsa hewar kir ji me
372. Ji lew me dikuşt wî bi derbê şedit
Hetanî bi îro derî bû kilît
373. Dema tu bi teşrîfê hatî ‘elen
Me gazî kirê ya ‘Elîyê Hesên
374. Eger tu dixwazî ji sîm û ji zêr
Cewabê bide hem li me guh bidêr
375. Bi derhal te da me cewabek delal
Me zanî tu yê sahibê milk û mal
376. Welî mujdeyek dê bidim te ‘elen
Ku xiznek ji bo te heye der Yemen
377. Eger tu biçî nik Yemen ey bira
Ku bigrî xezîne tu bînî vira
378. Gelek çêtir e ew ji bo te şebab
Bizane ji min ev nesîhet sewab

379. Welêkîn ejî pur ricayê dikim
Tu destûr bidî min kû da ez biçim
380. Eger ruxsetê tu bidî min delal
Dewamê dikî tu bi milk û bi mal
381. ‘Elî go ji bo maridî xizneyê
Çewa te rihakim ji vê xaneyê
382. Ku îlla biçî tu bîladê Yemen
Tu bînî xezîne li nik min ‘elen
383. Dema ez xezîne bibînim tamam
Muheqqeq te aza dikim ey xulam
384. Dema maridê dî cewaba tucar
Gelek ew bi vê mujdeyê bû kubar
385. Digoî ji bona ‘Elî hanê han
Were min emîn ke di wext û zeman
386. Çi wexta ku bînim ewî xizneyê
Tu aza bikî min bi vê mujdeyê
387. ‘Elî wî emîn kir bi husn û rida
Bi rê ket evî marida wek feza
388. Bi derhal ‘Elî gote marid heman
Çi êşek mezin çê bû wext û zeman

389. ‘Ecel ke xwu bighîne Misra qedîm
Werîne jina min digel wan yetîm
390. Bi ‘îzz û bi hurmet gelek îhtîşam
Werîne li vir wan hemî bittemam
391. Ne’em gotî marid îzin jê dixwest
Wekî wî bi setrencê bir çendî dest
392. Kû sê ro temam be li vir wan bixwaz
Bi texte rewanî bi ‘îzz û bi naz
393. ‘Elî rabû ser xwu bi cehd û teleb
Ku cîkî bibîne veşêre zeheb
394. Heman dîtî sexrek dî jora derî
Wekî buxrîyek tê de sun’ê perî
395. ‘Elî dest dida buxrîyê hanê han
Kevir hate xwarê di wext û zeman
396. Di derhal vebû qapîyek pir mezin
Muheqqeq e va sun’ê ‘îfrît û cin
397. ‘Elî dî kû odek muzeyyen nefis
Ji jêrê heta jor tijî bû ji kîs
398. Hemî tev dirûtî miheyra kirî
‘Elî yek bi yek wî ji cî rakirî

399. Yeka yek tijî kir ji zêr û guher
Heta wî nema taqet û yek mefer
400. Nîhayet ewî tev hilanîn hemîn
Ewî tev cem' kir di odê yeqîn
401. Derî girt dema lewlebê ba dida
Kevir çû tevî lewlebê cî dida
402. Li dû radîbû hate xewar bê hîcab
Diseknî li ser mesteba puştî bab
403. Dema wî qu'ûd kir li ser mestebê
Yekî dî qu'ûde bi vê mertebe
404. Heman go fetihke derî ey bira
Me îşev nekir xew ji halê tera
405. Derê wî fetihkir bi zanî kî ye
K udî ew 'ebidê xewî xanîye
406. Dema wî 'Elî dî li ser mestebê
Bi hey'et qu'ûde bi vê mertebe
407. Hema ew rucu' bû bi alî tucar
Ku da ew bidê mujdeyek pur kubar
408. Bi lez çû 'ecel kir giha taciri
Mi dîtî qu'ûde 'Elî ber derî

409. Bi keyfû sefa ye ne êş û elem
Were wî bibîne eya muhterem
410. Dema seyyidê wî bihîstî kelam
Ji hindavde rabû bi sed îhtîram
411. Heta hate ba xanî pur mexûf
Tefekkur di dilda fikir sed elûf
412. Dema di q'ûde 'Elîyyê tucar
Selamek da lî ser wî selamek kubar
413. Dîgotî te îşev çê dîtî 'eyan
Were tu jimin ra bike vê beyan
414. Ji bo te me îşev ebed xew nekir
Dihate dilê me hezaran fikir
415. 'Elî da cevabê cevabek temîz
Min tiştêk nedî ey tucarê 'ezîz
416. Ku îlla diçûm odeya pur bilind
Mi danî li ber xwu gelek mûm û find
417. Hetanî subê radîzam bê henek
Nehate dilê min ne reyb û ne şek
418. Dema bû sube radibûm ser piya
Mi qet kes ne didîtî nebû kes xuya

419. Mi destmêjê girtî li mêj pê dikir
Nehatî dilê min ebed yek fikir
420. Dema bu tamam ev li mêja delal
Xu ber jêrê berda bîla qîl û qal
421. Mi hatî qu'ûd kir li ser mestebê
Tu hatî mi dîtî bi vê mertebe
422. Eve ji xayrî vî tiştêk nîye
Mebêje gelo ev çî bû ya çî ye
423. Çikû ev Xudayê qedîr û 'ezîm
Dema min xelîq kir bi lûtfa 'emîm
424. Çî tiştê he ye Wî muqedder kirî
Muheqqeq dibînim li vê bifikrî
425. Ji tiştê muqedder nikarim hemen
Ku ji xu h'îfzkim bizane yeqîn
426. Nîhayet tucar jê re kir pur du'a
Xuda te selamet bike ez bela
427. Li dû wî emir kir 'ebîd û xedem
Ku bînin gelek xwarinê muhterem
428. Di gel xalî û hem bisatê kubar
Çî tiştê ku têtin ji mala tucar

429. Cewarî dihatin ser û bin tamam
Dişûştin bi avê hemî bê kelam
430. Hemalîk û carî bi vê xizmetê
Diseknin ji bo wî bi vê hey'etê
431. Çi hîna tucara bihîstî xeber
Gelek hedyê jêra kirin mu'teber
432. Ji me'kûl û meşrûb û melbûsê xas
Ku jêra ne 'edde ne jêra qiyas
433. Cemi' bûn li nik wî tucarê şehir
Hemî jêra xizmet dikin bi fexir
434. Heta wî di gel xu birin çarşiyê
Bi rê da ji wî tev dikin hîvî
435. Çi kû me ne qedrek ji bo te didî
Ji lew em ji ber te dikin pur fedî
436. Ricaê dikin em ji te bê qeder
Ji bo nexin der dilê xu keder
437. 'Alî da cevabê ji bo wan tamam
Ricaê dikim ez ji we xas û 'am
438. Ji van gotinê we dibim ez melûl
Çi tiştê we go tev li nik min qebûl

439. Çi kû we gelek qencî yû ihtîram
B imin kir qe nabit xefî ta qîyam
440. Di gel vê kalamê heçî em tucar
Bi hev ra bira ne di leyl û nehar
441. Gerek em ji hev ra bikin xizmetê
Bi qelb û dile xu bikin hurmetê
442. Li dû wan sual kir bi keyf û tereb
Ku weqta tu hatî ji Şam û Heleb
443. Li kê der dima karê wanê Misir
Ku da em bizanin meta tê şehir
444. Ku sê ro tamam be ‘Alî da cewab
Hemî hun bizanin ji min ev xîtab
445. Dema bu tamam her sê rojê giran
Heman dê ‘Alî yek ji îfrîte can
446. Dihatî li nik wî bi sed ihtîram
Ez im xadimê xezneya te tamam
447. Digoî kerem ke e ya zî hüner
Bila vê xezîne here bê keder
448. Ku ya’nî mi anî xezîna Yemen
Kerem ke here pêş xezîne ‘elen

449. Di gel van herî'ê te yê pur delal
Bi wan ra dev û qatirê zî cemal
450. Hemî tev bizane ji cinnê şedîd
Di gel van xudam û xulam û 'ebîd
451. Çikû xadimê xezneya pur 'ezîm
Berê xu dida şehre Misra qedîm
452. Heman di jina wî 'Elîyyê bi nar
Di gel wan sebîya hemî rût û taz
453. Bi lez wan hilanî di texte rewan
Bi her yek lîbasek ji xeznê heban
454. Heçî text û lebsê dianî 'elen
Muressem muneqqeş ji xezna yemen
455. 'Ecel kir ba Misir taciri
Digotî keremke Xuda heskirî
456. Tu rabe bi leq zewceya xu heman
Nebêjî çir apaş ketî eleman
457. Bi lez kir 'ecel kir heta vê deme
Ku riswa nebim ez di nîv 'alemê
458. Keremke tu jî zû 'ecelke bi xar
Xu bigihîne wê mehfela pur kubar

459. Dema mujde sehkir ‘Elî der meqam
Ji hindavde rabû ‘Elî bi kelam
460. Heta çû gîha wan tucarê şehr
Xeberda bi wan ra beyan kir emr
461. Dema wî beyan kir li wan ev emr
Digotî keremkin bi der vî şehr
462. Ku da em bi leq metcera xu herin
Keremkin bimin ra tevî min werin
463. We lîkin ricaê dikim bi melal
Emirkin li ser muhrimê pur delal
464. Ku ew jî beraber bi hev ra biçin
Ji bo îltîqaya h’erîmê hezîn
465. Ji bo ew nebêjin me hurmet nîye
Çikû ew nizanin heqîqet çiyê
466. Hemî jê re gotin gelek merheba
H’erîmê me jî ew di gel me teba
467. Heman wan h’erîmê xu hadir dikir
Hemî çûn bi hev ra bi keyf û şukur
468. Heta çûne nîv busitanê şehir
Bi hev ra bi keyf û henek wan dikir

469. Ji hindavde dîn wan ji dûr ve xubar
Ser û bin di bû ev xubar bê qerar
470. Xuya bû di binda bixal û deve
Hemî wan bi hev ra digotin eve
471. Reîsê li ser qefleê hanê han
‘Ecel kir heta ba ‘Elî an zeman
472. Bi derhal peya bû bi keyf û sefa
Xu avêtê dest û piya bê cefa
473. Digotî e ya seyyidê el eman
Were min ‘efûke di weqt û zeman
474. Eger çî me te’ xîrê kir ev qeder
Me bê h’ed div ê hizmetê dî keder
475. Me xwestî ku îşev dixûl bin şehr
Ji qati’ terîqa dikir me fikir
476. Ji lew em diman çarî rû bîttemam
Hetanî Xuda serfê kir ev zilam
477. Ji hindavde rabûn hemî ev tucar
Yek a yek li hespê xu bûne suwar
478. Beraber bi qefle diçûne şehir
Bi keyf û sefa û bi ‘izz û fexr

479. Hemî mane heyrî ji vê m'ehmelê
Xeber dan tijî bû ji vê m'ehfelê
480. Çi îhsan Xuda kir li vî taciri
Muheqqeq Xuda pur ji vî heskirî
481. Çi kû me di 'umrê xu de bê melal
Nedîtî wekî vî bi mulk û mal
482. Sexîyy û kerîm e bi wechê hesen
Wekî wî me nedîye di dunya 'elen
483. We hem mane heyrî h'erîmê dîwan
Ji lebsê ji navê 'Elîyyê cîwan
484. Me nedye wekî wî bi lebsê herîr
Muweşşeh muzeyyen bi text û serîr
485. Nîhayet hemî keyf xweşîn tev bûyî
Herîmê dîwan gel herîmê diwî
486. Beraber bi hev ra diçûn menzelê
Hemî tev peyabûn bi wî mehfelê
487. Heçî bar û 'ehmalê van qatira
Hemî wan dixûl kir di hewş û sera
488. Hemî kirne xezne di nîv firçeya
Ji kes ra ne m'elûme nabit xuya

489. Nîzanin div an h'ewselê m'ehmelê
Çîye ta bibêjin di vê m'ehfelê
490. Nîhayet h'erîmê tucarê şehir
Bi hev ra diçûn jorê qatê qesir
491. Ku dîtin muheyra bi furşê 'ezîm
Muzeyyen muterrez çû baxê ne'îm
492. Dema wan h'erîma li ser kir culûs
Gelek pê mufferreh dibûn ew nifûs
493. Bi keyf û surûrên hemî bittemam
Bi h'ezz û nesîbin di jorê meqam
494. Li dû et'îmê xwarinê terze terz
Muheyra dibû ji bo wan bi lez
495. Bi hev ra dixwarin bi keyf û sefa
Ne têb û eziyyet ne vira cefa
496. Bi çayê bi k'ehwe divê m'ehfelê
Bi mîsk û bixûr û bi ava gulê
497. Heta meclîsa wan temam bu delal
Bi xatir bi hev ra hemî çûne mal
498. Li gora xu her yek hudayê kubar
Dişandin ji bona 'Elîyye tucar

499. ‘Ebîd û cewarê dişandin gelek
Bi keyf û sefaê hemî yek bi yek
500. Welî ev tucarê xuyê qesr û ban
Muqîme li nik wî ‘Elîyyê cuwan
501. Hetanî ku xalî dibû kes nema
Li dûr wî digotî ji bo wî hema
502. Bira ev ‘ebîd qatir û van deva
Bibin xan û manê di me çend şeva
503. Heta ew rehet bin ji t’eba sefer
Ku da ew bimînin hemî bê keder
504. ‘Elî go gerek îşevê der ‘ecel
Ji şehre bi der bin eve bê x’elel
505. Îcaze mi da we eve wesselam
Gerek derkevin hun ji şehre tamam
506. Dema wan ku s’eh kir hemî derketin
Heta jorî Bexda hemî lez ketin
507. Ku şev hate ser wan firîn ber hewa
Xelas bûn ji vê z’ehmeta bê dewa
508. Êlî ma di gel sahibê beytê tek
Bi suhbet bi hev ra dîkin yek bi yek

509. Heta ku şev bûrî tucarê delal
Îcaze dixwestî ku ew bête mal
510. ‘Elî jê re go merheba ey tucar
Di destê te de ye îzîn ey kubar
511. Keremke tu aciz bûyî bê qeder
Ji bo min tu hinde mekişê keder
512. Çikû te gelek zehmet û pur cefa
Dîye te ji bo min qe nabit xefa
513. Tu jî mîslê bavê minî bê henek
Gerek tu di vir da nekî reyb û şek
514. Nîhayet tucar çû heta hate mal
E wî bo jina xu dikir keşfê hal
515. Wekî wî sexîyy û beşaşet yeqîn
Min nedye wekî wî li ruyê zemîn
516. Li dû wî ‘Elî çû heta ba h’erîm
Dipirsî ji wî zewceya pur kerîm
517. Gelo w eli pey min di vê muddetê
Çewa bûn xelas hun ji vê hâlete
518. Jinê da cewabê ji bo wî digot
Ji bursa me cerg û dile xu disot

519. Gelek rût û tazî diman bê qeder
Bi t'eb û ezîyyet bi kerb û keder
520. Heta Xaliqê 'alemê rehmê kir
Gerek ji bo wî bikin pur şukur
521. Şevê barîhe min didî şexsekî
Ji erde me hilda wekî teyrekî
522. Heta ew bilind bû çû 'ewrê buhar
Ji bo xu me nedye ne cay û qerar
523. Welî bê derer em wuha hilfirîn
Nizanin çi hate serê me yeqîn
524. Heta hate xwarê mi dî qafîlek
Bi xal û hemîr û deve yek bi yek
525. Mi pirsî ku kîne çi bar û deve
Çi cay û mekane sualam ev e
526. Cevab dan ji bo min hemî wan 'elen
Xulamin ji bo na 'Elîyyê Hesên
527. E wî em dişandin ji bo w ehemin
Kuda we bibin şehre Bexda yeqîn
528. Digotî mesafe ji vir ta şehir
Sebir ke ji mexrîb heta ye fecir

529. Me anî suwar kir li texte rewan
Me nedye çewa em dihatin heman
530. Heta em dihatin li nik we tamam
Bi ‘îzz û bi fexir û gelek îhtîram
531. Welî wî dema me suwar kir heman
Devê sendiqek wî vekir an zeman
532. Ji vê sendiqê cill û xişrê ji zêr
Deranî digo hun lebis kin bi xêr
533. Dema me lebis kir çewa wî digo
Devê sendiqê girt kilîd da migo
534. Emanet bikî vî kilîdê bi xar
Heta tu bidî wî ‘Elîyyê tucar
535. Nuha ew bi min ra di cêba mi da
Kesek pê nizane ji xeyrê Xuda
536. Heman wî ji ceybê deranî kilît
Dida destê ‘Elîyyê Hesên wî ku dît
537. Digoî ji bo zewceya pur emîn
Eger sendiqê tu dinasî yeqîn
538. Were şanî min de ku da em bizan
Çi têda vucûd e di weqt û zeman

539. Ne'am gotî vî hurmeta mu'teber
Ji bûra digotî hemî serte ser
540. Hema radibû ew 'Elîyyê tucar
Di gel wî jina xu heta hate xwar
541. Çiqasî senadiq li hewşê hebûn
E wî pê nîşandan senadiq butûn
542. Heman dîtî ew sindiqa cil di nav
Digotî bizane ji min bê xîlaf
543. Eve ya ku cil derdixist maridî
Digote 'Elî dê kilîtê bide
544. Dema wî exiz kir kilît jê heman
Devê sendiqê wî vekir bê guman
545. Heman dê tijîbû ji xişrê kubar
Temamê kilîta di wê da veşar
546. Yeka yek hemî vî vekir an zeman
Ku dîtî tijî ne ji tiştê giran
547. Ji yaqût û mas û ji rîv û ji zer
Ji durr û cevahîr e ya mu'teber
548. Li dû wî qefil kir hilanîn kilît
Diçûn xezneya jor ku ewwel didît

549. Heçî zîv û zêr û cewahîr hebûn
Bi wî da nîşanê ‘Elî tev butûn
550. Jinê ji sual kir e ya mu’teber
Ji keder bi destê ket ev guher
551. Bibêje ji bo min sebeb vê çî ye
Ku da ez bizanim hemî cî cî ye
552. ‘Elî da cewabê bizane ji min
Hemî tev bi fedla Xudayê Mezin
553. Çikû ez jinik we dema ez derketim
Mi rê daye ber xu hema lez ketim
554. Nizanim biçim kê derê wey li min
Çî hate serê min hemî tev ji min
555. Diçûm di rê da bi t’eb û cefa
Ji bo xu nedî di rê da sefa
556. Nîhayet hemî wî hîkayet dikir
Ji ewwel heta axirê kir zikir
557. Ne hewce dirêj kim dibit pur melal
Kesê ku zikir ket dibit kerr û lal
558. Me kin kir ku da pur melale nebit
Çikû pur dirêjî melalet dibit

559. Jinê jê re gotî bike pur şukur
Ji yumna duaê ku bavê te kir
560. Gelo te jibîrker vesîyya Hesên
Di nîv meclîsê da kirî wî ‘elen
561. Digoî Îlahî bi zat û sîfat
Çi şiddet bibîne li pey be necat
562. Tu jî pur hemîd ke ji bo Zîlcelal
Ku da te gelek gewher û mülk û mal
563. Nebe tabî’ê fasiqa el eman
Te dîtî çî anîn serê te heman
564. Hudûdê Xuda pur bike dîqetê
Ku belkî Xuda te nexet şiddetê
565. ‘Elî jî qebûl kir çî pend û wa’iz
Ji tiştê xerabî min bike hîfiz
566. Me dûrke ji etba’ê sûê xerab
‘Efûke bide xatirê da û bab
567. Ku tewfîq bide ew ji bo ta’etê
Ku da ez bibim tabî’ê sunnetê
568. Nîhayet ‘Elîyy û jina ba neseb
Di gel wan sebîyyê xuyê ba edeb

569. Bi hev ra diman ew bi keyf û sefa
Wekî wan nedîtî ebed yek cefa
570. Xulase fetihkir 'Elî yek dukan
Di sûqa tucara di weqt û zeman
571. Gelek cewher û m'edenê pur semîn
Dixistî dukanê 'Elî ecme'în
572. Li ser merteba xu culûs kir 'Elî
Li nik wî 'ebîd û xulamê diwî
573. Bilind bû heta bû reîsê tucar
Di niv şehre Bexdadê bu îştîhar
574. Melîk pê hisa yek tucarê kubar
Ji Misrê dihatî bi sed îftîxar
575. Heman qasidek wî dişandî li bal
Ku ye'nî keremke tucarê delal
576. Melîk te dixwaze e ya muhterem
Ji bo te bibîne e ve la cerem
577. Semî'na ete'na 'Elî da cevab
Çikû ferd û 'eyn e ne'em bê xîtab
578. Heman wî hilanî hedîyyek tamam
Ku da ew biket jê re pur îhtîram

579. Di gel çar firaqê zêrî kubar
Tijî kir ji mas û guher bê qerar
580. E van gewher û m'edenê bê qeder
Li nik tu mulûka qe nabit esere
581. Nîhayet 'Elî çû heta ber derî
Ji hâkim îzîn xwestî wî taciri
582. Îzîn hat ji bona 'Elî an zeman
'Elî bû duxûl ev di qesra giran
583. Selam da li ser wî bi 'izz û nî'em
Gelek merheba go e ya muhterem
584. Te sebra me anî tu hatî li vir
Bi te îftîxarê dikin 'ebd û hur
585. Li dû go 'Elî ya melîkê zeman
Ez im 'ebd û kole ji bo te heman
586. Ricaê dikim ez nekî min melûl
Hedîyyek mi anî bikî tu qebûl
587. Eger çî biçûk e hedîyya di min
Gerek tu qebûl kî bi fedla mezin
588. Ne'em gotî sultan bi vechê telîq
Çi hedye te anî qebûl e heqîq

589. Heman wî li ber danî hedyâ kubar
Kesî ev hedîyye nedîtî tu car
590. Melîk ma ye heyrî ji van gewhera
Çikû kes nedîtî li cay û dara
591. Digoî hemû qebûl e hemî serteser
Li nik xu dibînim gelek mu'teber
592. Eger hes biket ew Xudayê 'Ezîm
Mukafe didim ey tucarê kerîm
593. Nihayet bi xatir 'Elî hate mal
Ji bo zewceya xu kirî keşfê hal
594. Melîk gazî kir dewleta xu heman
Ku da mes'ela xu li wan ke beyan
595. Dema ew dihatin li nik wî tamam
Li wan erdê kir wî çû qesd û meram
596. Ku y'enî tamamê mulûkê mezin
Dişandin hedîye ji bo binta min
597. Kesê da hedîye bi mîslê tucar
Eger hun dizanin bibêjin bi xar
598. Hemî dan cewabê me nedye yeqîn
Wekî vê hedîyyê li ruyê zemîn

599. Ne hâkim ne tacir ji qismê beşer
Nikarin verîkin hemî serteser
600. Melîk ku dixwazim ku qîza delal
Nîkah kim li vî tacire zî cemal
601. Gelek mu'teber ez dibînim heman
Bu we îstîşare dikim her zeman
602. Bibêjin eger ev lîyaqet heye
Keremkin ku da ez bizanim weye
603. Wezîra cewab da ji bo hakimî
Lîyaqet dibinin ji bo wî hemî
604. Çikû ev kerîmate husnolvucûd
Gelek laîqe ey melîkê wedûd
605. Ku înkah bikî tu li vî taciri
Ku y'enî 'Elîyyê Hesên cevherî
606. Dema wî ku sehkir ji wan ev meqal
Bi vî gotina wan dibû îbtîhal
607. Emir kir li 'ebd û xulamê kerîm
Bibin vî hedîyyê li alî herîm
608. Li dû radibû padîşa çû sera
Emir kir li hedyê ku bînin vira

609. Digote jina xu were tu bibin
Tu perdê ji ser van hedîyya helîn
610. Çi n'îmet Xuda kir li me îxtiyar
Ji mal û ji cah û ji qedrê kubar
611. Dema hatû perde hilanî heman
Gelek ma ye heyrî ji van gewheran
612. Digotî e ya padîşahê kubar
Ji kî ja mulûkî dihat yadîgar
613. Mi nedye di 'umrê xu de ev guher
Hetanî nuha mi nedyê serteser
614. Muheqqeq ye kî ez mulûkê zemîn
Dişandî hedîyye ji bo me yeqîn
615. Ku husnolvucûdê bi 'izz û kemal
Bidin wî mulûk tev bibin kerr û lal
616. Melîk da cewabê ji bo zewcetê
J imin tu bizane di vê sa'etê
617. Yekî ez tucarê Misrê hate vir
E wî ev cevahîr hemî hedye kir
618. Çikû min bihistî tucarek mezin
Ji Misrê derket heta şehrê min

619. Mi şandî li pey wî ku hadir bibit
Wekî van tucara ‘înadê nekit
620. Ku da hinek cewherê bê misil
Bi heq em ji wî bistînin bê xecil
621. Ji bona cîhazê ku husnolvucûd
Beraber bibit ew ‘erûsa wedûd
622. E wî îmtîsala emir kir heman
Dihatî li nik min di weqt û zeman
623. Beraber kirî çar firaqê kubar
Hemî ev cevahîr kirî yadîgar
624. Dema hate ba min bi husn û edeb
Di gel ‘eqlê kâmil bi şiklek ‘eceb
625. Wekî tuxmeê van mulûkê zemîn
Bi fedl û belaxet li nik min yeqîn
626. Dema min ku wî dî bi lutfa Xuda
Mehebbet difûrî di qelbê mi da
627. Mi heskir ku husnolvucûda melîh
Bidim vî şebabê belîx û fesîh
628. Di gel min hedîyye hevale dikir
Li ser van wezîra bi qelb û fikir

629. We hem îstîşare dikir min bi wan
Di tezwîca binta me da an zeman
630. Hemî wan lîyaqet didî ey h'erîm
Cewabde ji bo min bi qelbê selîm
631. Cewab da h'erîmê ji bo hakimî
Li ser vê nîkahê ebed qaîmî
632. Çi tiştê Xuda hes biket dê bibit
Di hukmê xu de ew teserruf diket
633. Ji bona h'erîmê melîk da cewab
Kî husnulwucûdê bidin vî şebab
634. Nîhayet wuha ma heta sube
Melîk hat û runişt li ser mertebe
635. Emir kir ku bînin 'Elîyyê Misrê
Di gel kamilê tacirê ev şehir
636. Bir a ew cemi' bin li vê der tamam
Ku emrek heye ez bikim wesselam
637. Hemî ew cemi' bûn bi keyf û tereb
Li nik hakimê ev bi 'îzz û edeb
638. Emir kir ku qadîyyê Şer'a Şerîf
Bir a bê hudurê bi qelbê letîf

639. Dema hatî qadî li nik wî heman
Emir kir li ser wî di weqt û zeman
640. Tu husnolvucûdê nîkah ke bi xar
Li tacir ‘Elî tacire nazîdar
641. Heman rabû ser xu ‘Elî hanê han
Digotî ‘efûke eman sed eman
642. Çikû na durust e wekî min xebî
Bibin zavê sultan bi Şer’a Nebî
643. Bi derhalê gotî li min guh bidêr
Mi date di gel rutbeya şubhê zêr
644. Mi rutba wezîrî li te kir xelat
Ji rutba xebîyyê tu bûyî necat
645. Were tu keremke ku husnolvucûd
Bidim te qebûlke bi qadî şuhûd
646. Di ger jê re gotî ‘Elîyyê cuwan
Were min ‘efûke melîkê zeman
647. Te nî’met li min pur kirin bê ‘eded
Nikarim ji bin derkevîm ez ebed
648. Welê ez ricaê dikim bê qeder
Tu guhdêre da ez bibim yek xeber

649. Melîk da cewabê digo ey bira
Çî ye derdê li te bike eşkera
650. Metirse mebêje qebûl nabitin
Bibêje çi hate dile te li min
651. ‘Elî g oku madem tu teşrîf dikî
Bi husnulwucûdê ku înkah bikî
652. Bizane ji min ey melîkê zeman
Ji bo min he ye yek weledkî cuwan
653. Musemma bi navê Hesên ev delal
Bi ‘eql û kemale bi qed î’tîdal
654. Melîk go ‘ecelke div ê sa’etê
Ku da ez liwêkim e vî n’îmetê
655. Çikû min nizanî ji bo te weled
He ye ey wezîrê bi muhr û sened
656. ‘Ecelke bi ra bê hudurê ‘ecel
Ku da ez nîkahkim di beyna milel
657. Bi husnulwucûdê bikim serfîraz
Bi qanûn û ‘ud û ribab û bi saz
658. Ku da dest bikêşin mulûkê zeman
Ji husnulwucûdê bi derd û xeman

659. Bi derhal ‘Elî şand Hesên bo hudûr
Hemî ma ne heyrî ji sun’ê Xefûr
660. Digotin me nedye di dewra zeman
Wekî ev weled di çay û mekân
661. Bi husn û melahet bi vê hey’etê
Gelek ew lîyaq e bi vê dewletê
662. Hesên hate pêşî melîkê zeman
Selam da li ser wî selamek giran
663. Bi husn û edebe ew diseknî qîyam
Hemî ji re dibûn heyran wesselam
664. Melîk lê nezer kir bi çavê mezin
Digo çêtire ev ji bînta dimin
665. Bi husn û melahet bi ‘eql û edeb
Bi şîkl û bi sîma bi keyf û tereb
666. Melîk jê sual kir bi keyf û henek
Ku namet çî ye bêje ey çav belek
667. Cewab da ji bo padîşa wî ‘elen
Ez im ê müsemma bi îsmê Hesên
668. Di vê hîne ‘emrê mi bû çarde sal
Xuda te hîfizke nebînê zewal

669. Heman der ‘eqeb padîşa emir kir
Li ser qadî dewletê bifikir
670. Nîkahke tu husnulwucûdê ‘elen
Li ser vî şebabî ku nav lê Hesên
671. Bi derhal qadî nîkah kir tamam
Li ser meclîsa hadirîn esselam
672. Li dû çûne malê kesê mehfelê
Tucar û wezîr çûn bi vê welwelê
673. Cemî’ê tucara du’ae ‘elen
Dikir wan ji bona ‘Elîyy û Hesên
674. Nîhayet ‘Elî çû bi vê hey’etê
Ji navê ku dî xel’eta dewletê
675. Jinê ji re go ey ‘Elî ev çî ye
E wê ev xelat da bibêje kî ye
676. Nîhayet ‘Elî jê re go serteser
Çî tiştê bibêtin qeda û qeder
677. Jinik pur muferreh dibû an zeman
Ku mîr bu wezîrê melîkê cîhan
678. Nexasim ku sultanê Bexda ‘elen
Nîkah kirye qîza xu da Hesên

679. Nîhayet ‘Elî wê şevê malê mal
Di nîv şehre Bexda dibû qîl û qal
680. Hemî dilxweşin bi vê mes’elê
Bi keyf û sefa tev diçin m’ehfelê
681. ‘Elî rabû ser xu dema bû sube
Heta ku xu gîhand menseba ratîbe
682. Bi leqva melîk çû bi ‘îzz û kemal
Dema rûdinişt wî fikir jê sual
683. Me qesde ji vir em dikin d’ewetê
Ku tu serfiraz bî di vê dewletê
684. Ku herkes bizane mi husnulwucûd
Didayê kurê te bi qadî şuhûd
685. Çi h’îna sîma’kin mulûkê cîhan
Mi qîza xu da te di weqt û zeman
686. Gerek ew biseknin nekin qîl û qal
Ji lew min teklîfê kir ev sual
687. ‘Elî go ne’am jê re da ev cewab
Çi tiştî emirkî ku aynê sewab
688. Bi keyf û bi şahî melîk emrê kir
Hetanî mehek çû e wî serfê kir

689. Dema bû tamam her sê rozê ‘eceb
Hesen kirne zava bi ‘îzz û edeb
690. Bi keyf û sefa ew diçûn xelwetê
Gelek ferh û şahî kete dewletê
691. Dema bû sube padîşah emrê kirî
Ku bînin binaêkin li vir yek qesir
692. Bi neqş û müzeyyen bi sun’e xerîb
Ku ji hîre bigrin rîcalê lebîb
693. Mihendîs dihatin cemî’ bûn tamam
Bi lez wan bînaê kir bi sed îhtîram
694. Di niv şehre Bexda kesê ev qesir
Nedîtî wekî wî bi ‘îzz û fexir
695. Hesen rabû ser xu bi ‘îzz û kemal
Heta çû culûs kir di qesra delal
696. Nihayet wuha man heta çendî sal
Bi keyf û xwoşî hem bi ‘îzz û kemal
697. Bi hev ra dibûrîn bi ‘eyş û rida
Heta hate ser wan qeder hem qeda
698. Li dû ev melîkê bi şerm û heya
Nexweş ket xu avêtî nava cîya

699. Bi roj û bi şev hem dem û sa'etê
Dikêşe ji vê 'îlletê zehmetê
700. Dema di dirêj bû li wî ev seqem
Nikarî xu bigre li her dû qedem
701. Emir kir bira bên wezîr û wuzera
Ku da bên cemî' bin bikim îstîşar
702. Cemî'ê wezîra yekayek tamam
Dihatî li hâkim dikir wan selam
703. Emir da ku rûnî li ser kursîya
Nikarim ku rabim li her dû piya
704. Çikû ez nexweş bûm bi êşek şedîd
Ji lew min dişandî li pey we 'ebîd
705. Ku belkî mirin tê hebit vê demê
Nizanim çi bêjim di vê 'alemê
706. Bi we îstîşare dikim bê hîcab
Ricaê dikim hun bidin min cewab
707. Çikû îxtîyarim mi nîne weled
Li dû min bisekne bi mûhr û sened
708. Ditirsim li pey xu ji e'daê din
Ku bên we debitkin hemî ecme'în

709. Mi qesde ji we ittîfaqê bikin
Li ser yek meriv kî ku pê debtêkin
710. Dixwazim e jî wî qebûlkim yeqîn
Ku da memleket pê hîfiz bit hemin
711. Cewab da wezîra bi hev ra ‘elen
Ku em qani’ in ya melîk bîlhesen
712. Çikû ew bi ‘eql û kemal û edeb
Wekî me nedye ji tuxmê ‘ereb
713. Gelek ew dizane meqamê kebîr
Bi rehm û bi şefqet li ser her feqîr
714. Ji xeyrê Hesên em qebûl nakitin
Eger na muheqqeq dibit pur fitin
715. Ku hîna sîma’ kir melîk ev kelam
Digo radîya we heye bîttemam
716. Ji bona Hesên zewcê husnulwucûd
Di piştê ku bimrim nekin hun cihûd
717. Nebin me li nik padîşah da xeber
Nuha em wî nakin melîk serteser
718. Bi serbest bibêjin ne şerm û ne fedî
Ku da ez bizanim kîye bo Xudê

719. Ne ‘eyb û ne ‘ar e ji bo we yeqîn
Ji bo ez bizanim hemî ecme’în
720. Temamen cewab da bi zehr û beten
Qebûl naketin em ji ‘eyrê Hesên
721. Hemî em qenu’in bi wî serteser
Muxalîf ji me kes tune yek nefer
722. Dema padîşah dî hemî sadiqin
Bi zahir bi batin ku mettefiqin
723. Digotî bira bên hudûrê kubar
Qumandan û qadî hemî tev bi xar
724. Çewa ku Xuda heskirî dê bibit
Sube ez dixwazim li vir tev bibit
725. Hemî wan semî’na ete’na digot
Ji êş û birînê wî dil wan disot
726. Dema ew jinik padîşah tev diçûn
Emir dan xelqê hemî wan butûn
727. Sube hun cemî’bin li nik hakimî
Çi tiştî emirke qebûlkin hemî
728. Nîhayet cemî’bun hemî der meqam
Yekayek li hâkim dikir wan selam

729. Bi hev ra digotin ki sultanê dîn
Hemî hadirin em li nik te yeqîn
730. Çi tiştê emirkî qebûl e heman
Emirke bibêje melîkê zeman
731. Serê xu hilanî melîk der ‘eqeb
Selam da li ser wan bi ‘îzz û edeb
732. Xîtab kir bi wan ra melîk wê deme
Ji ferdane hâkim li ser ‘alemê
733. Welêkîn melîkek xeyûr û sebûr
Ji zulm û ji te’da bibit düredur
734. Bikî hun qenû’in bikin hun beyan
Berê mewtê ez wî qebûlkim heman
735. Hemî wan digotî bi hev ra ‘elen
Rida me nîne ji xeyrê Hesên
736. Kurê wî ‘Elîyyê wezîrê delal
Xeyûr û sebûr e bi husn û cemal
737. Hemî pê qenû’in bi qelb û bi dev
Bi zahir bi batin ‘elen bi xef
738. Melîk go madem ku wuhaye emir
Keremkin herin wî hudurkin li vir

739. Welêkîn bi tertîb û bi ‘eql û edeb
Ji min lê selamkin selamek ‘eceb
740. Li dû hun bibêjin were ey Hesên
Melîk te dixwaze li nik xu ‘elen
741. Ji hindav de rabûn hemî serteser
Heta çûne nik qapîyê mu’teber
742. Yekî ez wezîra diçû ba edeb
Îzin jê dixwestî bi keyf û tereb
743. Hesên da cewabê kîye ber derî
Ji bo min bibêje meçe qehqerî
744. Bi serbest were rûnê ey muhteşem
Li nik min bizane tu yî muhterem
745. Cewab da wezîra hemî ecme’în
Melîkê zeman te dixwaze yeqîn
746. Keremke were em bi hev ra biçin
Li nik wî melîkê li ruyê zemîn
747. Go elbette emrek heye ey cuwan
Çi hîna biçî dê keşif ket ‘eyan
748. Ji hindav de rabû piya bê dereng
Li xu werkirin elbîsê rengereng

749. ‘Ecelkir heta ba melîkê kubar
Bi teqbîlê erda melîk kir duçar
750. Hesên go e ya sahibê mülk û mal
Emirke ji bo min bike keşfê hal
751. Ji bo te bi derd in bi êş in yeqîn
Xuda te şîfake li ruyê zemîn
752. Melîk go were nêzê min ey weled
Nebînî ne êş û ne derda ebed
753. Tu rûnê li nik min were nêzê min
Cemî’ê wezîra biçûk û mezin
754. Dixwazin melîk bê li ser wan heman
Hemî ew dixwazin bi rûh û can
755. E jî pur dixwazim bi can û cîger
Berê mewtê bey’et bidim bê keder
756. Heqîqet lîyaqet dibînim qewî
Çi tiştê mi gotî qebûlke tu wî
757. Ji hindav de rabû Hesên ser piya
Ji bav û melîk wî dikir pur heya
758. Digotî di nîv van wezîra hene
J imin ew mezintir gelek zêde ne

759. Ricaê dikim ez ji te el eman
Ji ser min hilîne vî barê giran
760. Heman wan wezîra bi hev ra tamam
Digo em dixwazin tu bî wesselam
761. Hesên go ku madem ev e îttîfaq
Ku bavê m di vê meslekê da lîyaq
762. Hema bav digotî ji bo wî weled
Hemî te dixwazin bi muhr û sened
763. Ji ber emre hâkim digel van bira
Muxalif nebe tu li wan eşkera
764. Dema ku Hesên dî bi vê hey'etê
Gelek wî heya kir ji vê h'edretê
765. Serê xu dibir nêzê erde heman
Ji şerma wezîr û melîkê zeman
766. Li dû go melîk hun bi vî qani'in
Li ser we melîk be bi 'ehda mezin
767. Bixwûnin gelek fatihe bê 'eded
Hesên bû melîk ew bi muhr û sened
768. Dixwendin e wan fatihe wê deme
Belabû ewî navê der 'alemê

769. Dema bû tamam fatîha h'edretê
Melîk gote qadî nivîs huccetê
770. Li ser van wezîra melîk bû Hesên
Li nik herkesê ev sened bit 'elen
771. Heman qadî hüccet nivîsa tamam
Dida dest melîk wî bi sed îhtîram
772. Melîk ev sened jê digirt hanê han
Bi îmdadê da dest wezîra heman
773. E wan jî ku îmdadê fikir serteser
Bi keyf û bi şahî sened mu'teber
774. Melîk gol i ser textê rûnê Hesên
Ku bey'et bidin te hemî ew 'elen
775. Hesên çû li ser textê rûnişt tamam
Wezîra li wî kir yekayek selam
776. Bi teqbîla destê wî bûn muhterem
Hemî dest li ser hev li pay û qedem
777. Emir kir ku rûnên div ê ta'etê
Ku da ez ji bo we bikim xizmetê
778. Dema rudiniştin li ser kursîya
Yekayek du'a wan fikir ser piya

779. Nîhayet heta ro diçû mexrîbê
Li ser hukim kir bi vê mertebe
780. Xelat û hedîyyê nefîs û kubar
Li ser van wezîra kirî yadîgar
781. Heta şev dihate li ser van tamam
Hemî çûne malê bi sed îhtîram
782. Li dû wan çû Hesen bi qelbê selîm
Heta xu gîhandî melîkê qedîm
783. E wî her dû dest lê ziyaret dikir
Ji sun'ê melîk radikir pur şukur
784. Melîk lê wesîkir bi teqwa Xuda
Emanet ji teqwa nebî tu cûda
785. Çikû wî Xudayê Metîn û 'Ezîm
Wehî şan dli ser Resûlê Kerîm
786. Muheqqeq bi teqwa dibin rû sipî
Li nik hedreta min mirovê xebî
787. Bi teqwa Xuda tev dibin serfîraz
Bi serbest diçin ser terîqa diraz
788. Xuda radîye ser hemî mutteqîn
Qebûlke tu emrê Xuda bilyeqîn

789. Hesen da cewabê digo ey peder
Ji bo min mekêşe tu hinde keder
790. Eger hesbiket ew Xudayê Wedûd
Ji xeyrê ‘edalet qe nabit wucûd
791. Du’aê dixwazim ji te bê ‘eded
Ku belkî Xuda şîne bo min meded
792. Nîhayet Hesen çû sera nazenîn
Bi leq wê ve hatin hemî ecme’în
793. Jina wî xesû tev bi leq ve heman
Ji wî ra digotin melîkê zeman
794. Mubarek be ev menseba tey ‘ezîz
Digel van lîbasê li te pur temîz
795. Li dû çû ziyaret biket bav û da
Ku da ew ji bo wî bikin pur du’a
796. Dema çû bi leq ve hemî radibûn
Bi keyf û xweşî tev ji wî ra butûn
797. Ser û çav û dev lê ziyaret kirin
Xuda te hifzket ji fitnê mezin
798. ‘Elî go bi teqwa Xuda ke ‘emel
Ji ‘umrê xu nabînî qet yek xelet

799. Emanet bişefqet be ser r'eyetê
Bi 'edl û bi ihsan bike dîqqetê
800. Xu têxe du'aê yetîm û feqîr
Evin ê ji bo te bibin destegîr
801. Nîhayet li wê ma heta bû sube
Nîyet kir ku rabe biçit ratibe
802. Li dû wî li mêj kir heta bû tamam
Hema çû heta ew gihîşte meqam
803. Wezîr û wuzare hem, cem'ê bûn
Yekayek selam dan li ser wî butûn
804. Hukim kir li ser wan bi nehy û emir
Wezîra ji bo wî dikir pur şukur
805. Hinek rûtbe da wan hinek bûn 'ezil
'Edalet dikir wî bi qelb û bi dil
806. Wuha ma heta mexrîbê ev delal
Cemî'ê wezîra hemî çûne mal
807. Li dû rabû sultanê pak û 'efîf
Heman dî melîkê qedîm pur de'îf
808. Selam da li ser wî ziyaret dikir
Melîk pê hisa wî li xu çav vekir

809. Hema wî xeber da digo ey lebîb
Bi xu ez dizanim ecel bû qerîb
810. Çikû emr û fermana Rebbê Qedîr
Dema bit hewale li merdê feqîr
811. Nikarî nefeskî bi dûr ve biçit
Ku da hukmê xu têda carî bikit
812. Nuha pê dizanim hikum bû li min
Bi emr û îrada Xudayê Mezin
813. Rida a mi jêra heye ey weled
Gelek hemd û şukrê dikim bê ‘eded
814. Welêkîn wesîyet dikim bê cihûd
Emanet li nik te bi husnulwucûd
815. Digel walîda wî feqîr û hezîn
Li nik te emanet hemî ecma’în
816. Xu dûr ke ji fi’l û xerab û şera
Mutî’be ji bav û ji dayê xu ra
817. Bitirse ji wê heybeta girdigar
Mulûkê cîhan ji dibin teng û tar
818. Xuda emrê kir ser hemî îns û can
Bi ‘edl û bi îhsan emir kir li wan

819. Cewab da ji bo gotî sultan Hesên
Bi qelb û bi dil min qebûl kir ‘elen
820. Semî’na ete’na e ya bav û ced
Nikarim xeberdim li nik te ebed
821. Çi tiştê emirkî mueqqeq dibit
Eger ew Xudayê Mezin hes bikit
822. Li dû ev melîkê qedîmê hezîn
Heta çare rû ma li ruyê zemîn
823. Wefat bû bi bal rehmeta girdigar
Hemî pê diêşan biçûk û kubar
824. Hilanîn bi xesl û kefen wê demê
Bela bû wefata wî der ‘alemê
825. Bi Qur’an û dewr û du’a man li ser
Heta bû tamam erbe’în serteser
826. Vegîran hemî tev bi kerb û hezîn
Di niv şehre Bexda bela bû gerîn
827. Wuha ma heta mehek t’ezîye
Kesê ku dihat Fatîhe xwendîye
828. Nîhayet hilat t’ezîya pur weqûr
Ji emrê Xuda radibûn pur sebûr

829. E ve ‘adetê Rebbê erd û sema
Wuha vê bizanin di gav û dema
830. Hesên musteqîl bû bi mulk û mal
Bi ‘edl û bi ihsan û qenc û delal
831. Gelek hesdikin jê hemî ‘alemê
Ji bora du’ aê dikin her deme
832. Zemanê Hesên bi keyf û surûr
Di çû tev bi hukmê Xefûr
833. Heçî bav wezîrê mezin der yemîn
Wezîrê çepê yek zilamek emîn
834. Hesên ma li Bexda melîkek mezin
Bi ‘edl û bi ihsan û hem heskirin
835. Ji qîza melîk qîz û kur zêdebûn
Li dû wî hemî bûn melîk ew butûn
836. Bi keyf û şahî wuha man tamam
Heta hate ser wan mirin wesselam
837. Beqabûn ji bona Xudaye Yeqîn
Bi xeyr wî fena ye hemî ecme’în
838. Hemî em wuha ne e ve nasîhe
Ji bo me bixwînin hemî Fatîhe

ENCAM

Nivîskar li gora me bi vê mijarê xwestîye ku şîretek wisa bide xwendevanan: Hevaltîya mîrovên xirab, kar û barên ne durîst dê bibin sedem ji bo xirabîyên mezintirîn. Digel vê di malbatê û di civakê de taxrîbatên mezin dê çî bibe. Her wiha ev peyam jî bi awayekî zelal di berhemê de xuya dike: ” Dostê bavan nabin dijminê lawan” . Lewma divê mirov her tim li wesyetê dê û bavê xwe guhdarî bike.

Herwiha nivîskar bi vê berhemê gihîştîye vê armancê û peyama xwe bi awayekî serkeftî gihandîye xwendevanan.

Hêja ye ku mirov destnişan bike ku xebatên bi vî rengî, dê gelek gencîneyên veşartî yên zimanê kurdî derxin holê.

Hêvîdar im ev xebata me jî bibe yek ji wan.

ÇAVKANÎ

Çağrıci, Mustafa “Nasihatname”,

<http://www.diyantislamansiklopedisi.com/nasihatname/ r.409>

<http://www.diyantislamansiklopedisi.com/nasihatname/>

Kuzucular, Şahamettin “Türk Edebyatında Nasihatnameler”,

www.edebiyatvesanatakademisi.com, 2015

Nûrî, Mele Mihemed, *Kîtabû Nuzhetu'n-Nufûs*, Dîyarbekir,2004

Şoşikî, Mele Muhammed, “*Nasihatname*”, Kent Işıkları, Stenbol, 2012

“*Türk islam Edebiyatı*”, Anadolu Üniversitesi yayınları, Enqere, 2015

PÊVEK

Pêvek 1-metnên orjînal ên berhemê (beşa duyem)

(Pirtûka destxet a fotokopî)